www.kaniya-sipi.de

* Zincîra belavokên Bingeha Êzidîyan li Dervey Welat

Jimare 1

hindek

# Du´a u Dirozên Êzidîyan

berhevkirin u vekolîna

Dr. Xelîl Cindî

Einbeck 1997

# Naverok


| **Mijar** | **Rûpel** |
|---|---|
| **Pêşgotin** | **3-5** |
| **Du´a Pistgirêdanê.** | **6** |
| **Du´a Fecrê.** | **7-8** |
| **Du´a Sibeykê.** | **9-11** |
| **Du´a Nezerê** | **12** |
| **Du´a Şifaqê** | **13 -14** |
| **Du´a Sibê** | **15-17** |
| **Du´a Sipêdehê** | **18** |
| **Du´a Rojhilatê** | **19-20** |
| **Paşdu´a** | **21** |
| **Du´a Nîvro.** | **22-23** |
| **Du´a Hêvarî.** | **24-26** |
| **Şehda Dînî.** | **27-28** |
| **Du´a Tawsî Melek.** | **29-30** |
| **Du´a Oxirê.** | **31-32** |
| **Du´a Biskê.** | **33-34** |
| **Du´a Kêma Heyvê.** | **35** |
| **Du´a Sifrê.** | **36** |

# Pêşgotin

**Li civateke gundiyatî, şivantî, eşîrtî u binemaltî, li civateke kevne paşketîda u li bin barên xoristî zorda, wek jiyana di nav çiyanda, ne rê, ne ronahî,ne tixtor u xundewarî, xo parastin ji heywanên dirrinde...htd.,di barên wisa da ne e´cêbe xoristiyeke wisa, mêjî , bîr u bawerên mirovan gorî xwe vestirîne,dan u standina nêva xelkê danê u bihêle girêdana eşsîret u binemala bi hêzbe.**
**Tiştekî locîkîye, bîr u bawer, fikra dîn li gorî wê tebîetê bête avakirin u li dawîyêda îmaneke pirr bi diyardeyên xoristîve peyda bin, ew diyardeyên her roj beranberî mirovî tên;wekî şev u rojê(tarî u ronahî),derketina heyv u stêra, bay u baran, rabûna tofana,..htd.,di vî warê han da netiştekî e´cêbe mirov bêt u Xudanekî bo wan diyardan çêke u dawiyê here du´aya jêra bike u rehmê jê bixwaze u şerê wan ji xo durxe! anku eve mirov palvedaye wê yekê îmanê bi qewet u hêzên winda bûyî bike u hinek rêkên sivik bo beranberîya wan peyda bike. Ji bo wê yekê „Du´a u diroze„ buwe yek ji wan çekan, ewên aqilê mirovê berê peyda kirî, heta bawerîyên xo bi rêka wan du´a derxe. Li vir da Du´a rengeke ji rengên destpêka peydabûna fikra bawerîya dînî.**
**Heta bêjî Êzidîya Du´a u diroze hene. Emê mavê ew yên em dizanin hildîn:**

| | |
|---|---|
| **1- Du´a pistgirêdanê.** | **13- Du´a nezerê.** |
| **2- = fecrê.** | **14- = zerkîyê.** |
| **3- = sibeykê.** | **15- = zigêşê.** |
| **4- = nîvro.** | **16- = oxirê.** |
| **5- = êvarî.** | **17- = dubişkî.** |
| **6- Şehda dînî.** | **18- = stêra dembilqapî.** |
| **7- Dûeaya Tawsî Melek.** | **19- =girêdana devê gûrgî** |
| **8- = biskê.** | **20- = birina gêrgêratkê.** |
| **9- = sifrê.** | **21- = newqandina mîzê.** |
| **10- = êşa memkê jinkê.** | **22- = mehrê.** |
| **11- = êşa didanî.** | **23- = temametîya Şêxadî** |
| **12- = kêma heyvê.** | |

**Heke mirov li navê van Du´ayên derbaz bûyî meyzeke, ewê diyar be:**

# Du´a u dirozên Êzidîyan----------------------Dr. Xelîl Cindî

**A- çawa civata gundiyatî- şivantî karekî mezin kirîye ser dan u standinên xelkê li gel hev u têkelîya wan li gel dinyaya dor u berî wan. Wê dinyayê mirov palveda li fecrê, berî roj derkeve, zu ji xew rabe, xo karke. Du´a piştgirêdanê nîşana wê yekêye, çunke mirovê li ber pezî be, yan xwedan çandinîbe, nikare bi cilêt dirêj, berdayî kar bike, pişta xo girê nede. Ji ber ku ewê hemû wê rojê kar bike; ewî pêwistî bi bawerîyeke derûnî(nefsî) heye, ew jî Du´a piştgirêdanêye wek dermanekî bo giyanê wî.**

**B- Rola mezina Roj di dîyanetê Êzidîyada di leyzit. Êzidî çar Du´ayên xweyên giring ji rojêra dibêjin:( Du´a fecrê, sibê, nîvro, êvarî). Roj matiryalekî dinyayî pirr mezin u pîroze; nûr u germîyê dide cihanê, xêr u bereket jê çê dibe....ji ber wê yekê Êzidî bi hurmet beranberî wê disekinin u wekî gula berberojê li gel livîna Rojê, ew jî dilivin.**

**C- çunke Êzidîya baweriyeke mezin bi dînê xo heye, berî razên şehdeya xo diden, navê xas u Milyaketên xo dibêjin.**
**D- Tawsî Melek rol u ciyekî bilind di bawerîya Êzidîyanda dibîne, ji ber wê yekê Du´a Tawsî Melek herdem li ser zimanê Êzidîyan tê.**

**E-çawa girêdana eşîret u babka di nêv Êzidîyanda gelek xurta, wisa jî girêdana wan bi şêx, pîrê wanve xurte. çawa yekî keryekî pez hebe, nîşan bike, dirhoyê xo danê ser, wisa jî şêx biska zarokên mirîdên xo distîne, dirhoyê xo dixe ser u (Du´a biskê) li ser dibêje.[1]**

**F-Demê berê, barê civakî, barekî zorbû; şer, talankirin di nava eşîreta da hebû.hatin u çon, girêdana alemê bi hevra kêm bû. metirsîya heywanên kûvî u dirrinde zav bû,...ji ber wê yekê, demê mirovekî mala xo, ciyê xo, di hêla, dixwast tên u hêzekê bide canê xo, hîvîyê ji cina, ji hêzên nediyar bixwaze, kû ew wî biparêzin u bi silametî vegerîne mal. ew bû (Du´a Oxirê u Stêra dembilqapî ) kete nav rêza Du´ayên Êzidîyan.**

[1] Li cem milletên Mîsopotamîyên kevin, pirç û hirîyê ciyekî taybet hebu. Heta niha jî li cem Êzidîya ew sûneware maye nexasme rêzgirtin û pîrozîya Xerqey; ewê ji hirîya peza tê çêkirin û mirovên dîndar li ber xwe dikin.

Du´a u dirozên Êzidîyan-----------------------Dr. Xelîl Cindî

**G-Behra bitir, jiyana mirovê berê li ser çandinîyê, terş u tewalî; anku pez u dewara bû.her wî demî xelkê çekên wisa nebûn bikarin xo ji gûr, heywanên din biparêzin. yan dermanên wisa nebûn bikarin dexl u danê xo ji gêrgêratka biparêzin...ji ber wê yekê mirovî bawerîya xo îna (Du´a girêdana devê gurgî u du´a birina gêrgêratkê) çareserîya derdên wîye.**

**H- Dîsa, demê berê hekîmî, tixtorî, derman dikêm bûn,êş di zav bûn, mirov mecbur dibû- yan dixwast-wê bawerîyê ji xwera çêke ku ev du´ane ewan êşan çak dike, wekî (Du´a didan êşanê,kêma heyvê, zig êş, zerkî-nexosîya mêlakê-, êşa memkê jinkê, newqandina mîzê, nezer,...htd.)**

**I-çunke civata eşîrtî, civateke nandayî bû, ewan wisa bawer dikir nan u xwarin ji xizîna Xudê tê, ji ber wê yekê nanê xwe hem bo saxa , hem bo mirîya pêşkêş dikir. Ji ber vê yekê jî edebê ser zadî, pîrozîya xwarinê u sifrê peyda bû. Du´a sifrê hate gotin u heta niha jî di hête gotin.**

**Em dikarin bêjin , Êzidîyan her wekî hemû dîyanetên din, adet, loqet, Du´ayên dînî hene u bi zimanê kurdî di hêne gotin wekî yarîyeke giyanî(nefsî) di nêvbera mirovê Êzidî u Xudê u Xudanê wî da.**

**Du´ayên (Tawsî Melek, Fecrê, Sibeykê , Nîvro, êvarî) du´ayên here fer u giringin,ji ber wê yekê emê bi wan dest pê kin :**

# Du´a piştgirêdanê

**1-Ya Rebî! mehderekê ji te dixwazîn**
**mehdereke xêrê :**
**êk keramet,**
**êk şefqet,**
**êk zar, êk ziman**
**êk dîn, êk îman**
**êk aqil, êk fam.**

**2- Ya Rebî! tu aqil u famî di serê min bikî**
**tu pisyareke xêrê li halê me u vî miletî bikî.**

**3- Ya Rebî! tu bideye xatira delîl xelîl,**
**Alaya delîl,**
**axir zeman,**
**hisnî zirbaba[2]**
**xas u qelendera,**
**surra mixfî pê pira selatê,**
**dikra dendelî rehman,**
**Can ibin Kehîm,**
**Eswedî Berlîm[3]**

¤ ¤ ¤ ¤

[2] neye dure gotina ,,zirbab,, û ,, babzer,, kû gelek cara di qewl û dûeayên ـتzidîyanda tê, ji gotina ,, mirzeban,,a farsî,yan bêjîn ya hino-êranî hatibe wergêran. raman ji ,,mirzeban,, ewe yê memleketê diparêze. demê berê xûndkarê welatê faris,waliyek yan wezîrek desnîsan dikir bo wilayetekê heta bac û xeracê komke û bo xûndkarî bisîne. ez vê dibêjim cûnke heta niha di qewlê ـتzidîyanda ,,Sêsimsê wezîr,, yan ,, Sêsimsê teter,, yê kû digerêt. îroroj sêxê Sêsimsa ewê li gel Tawsê digerê dibêjnê : sêxê wezîr.

[3]ev dûeaye hêja (Xêrî Lias Pûrto) roja 16.4.1993 ji mera hinartibu.

## Du´a Fecrê

**1- Mêr u Meleka deyin medeha**
**u xasêt nava qubeha**
**ronahî dabû berê sibeha.**

**2- Ronahîya berê sibê dahir bû**
**Borê[4] ´ibadetê siwar bû**
**sed xozma wî mêrî, bi heqî rawista bû**

**3- Aşiq u maşuq mifte bi deste**
**me miraza xo ji wan dixweste**
**ewam miraza xwe bi heqî[5] dixweste**

**4- Ya mêrêt sibê, sibeha nû[6]**
**Ya Melik Şehîd[7], ya nefesa siltan Êzîd**
**heta êk bixwaze, tu Şêx u ez mired!**
**ezî razîme, meferê meye siltan Êzîd!**

**5- Ya mêrêd sibê, siba „mişoklîn„**
**Tanc ji ewelîn, heta bi axirîn**
**xêra bide, şera wergerîn**
**heq hemdilla „ rebil alwmîn„**

**6- Feqîr „´alî„, mîr li wehdanî**
**ya Xudê du´aya me qebul bikî**
**ji du´aya mominêt çak, extiyarê mixfî,**
**li ber dergehêt xasa,**
**ya Xudê amîn!.**

**7- Şêxadî şêxê heqîqetê**
**xudanê me´rifetê**
**zerb u keramet ji ba te tê!**

---

[4] Bor: diyare wekî heywanekî efsane xoya dibe, yan wekî hespekî efsaneyî pîroz.
[5]ez bêjim rastir ewe bêjîn: ewan miraza xwe ji heqî dixweste, anku ji Xudê.
[6] Êzidî bo her diyardekê (zahire) Xudanekî dadinên. Anku: sibê, êvarî, şevê, rojê, bay,....her yekî Xudanê xwe heye.
[7] Melik Sehîd: diyare naveke ji navêt Êzî. dûr nîne jî raman jê „ Şehîd bin cere„ be ; ewê Êzidî dibêjim: em ji wîne, ne wek ji Ademin!„.

**8- Şêxadî şêxekî çêye**
**dana me´rifet u rêye**
**´erd u asman xoş te divêye!**

**9- Şêxadî şêxe u hine**
**bînaya çavêt mine**
**çend ûsfet jê diçine**

**10-Şêxadî, Melik Şêx Sin bi şêxîtî qebiland**
**´Ers u kursî bora xemiland**
**Mêr u Milyaketa li asmana bora hilhiland!**

**11-Şêxadî li hestî nezer kir**
**hestî ji keremê nûr u neder kir**
**Pedşayê nim bi Şifqet u rehmeta xwe kir**

**12-Şêxadî şêx meqbule**
**zeyinandî hestîyê sture**
**dîwana Şêxadî şifqet u mihbet u nûre!**

**13-Şêxadî şêxê kafê**
**ewilê wî li elifê**
**Lewh li mehfûz navê Xudê![8]**

**14-Şêxadî şêx Berkate**
**bi wê nûrê kir xelat**
**lew firî ço semawat !.**

¤ ¤ ¤ ¤

[8]Li hêreda wek xoya dibe Şêxadî naveke ji navên Xudê u di ,, Lewh li mehfûz,, da hatîye.

# Du´a Sibê

**Piştî hilatina rojê, her Êzidîyek ji xewê şiyar dibe u dest u çavên xwe dişo u pişta xo girê dide u kumê xo, yan cemedanîya xo di havêje ser serê xo, bi eşq u dil berê xo dide rojhilatê, herdû destên xwe danête ser yek, beranberî Rojê disekine u du´a sibê dibêje.piştî du´aya xo bi dawî tîne, xwe kin dike ´erdê u sê cara li şuna Rojê mac dike, destên xo bi ser u rûyên xweda tîne u şikrînîyê ji Xudê, Tawsî Melek, Xasa dixwaze.xêr u bêbelayê , ji xo ra, ji milletê xo ra, ji hemû mirovên çakra dixwaze.**
**Du´a bi vî awayî di hête gotin :**

## pişka êkê

**1- Amîn amîn**
**tebarek li dîn**
**„Allah ahsan al xaliqîn„**
**bi himeta Şemsedîn**
**Fexderedîn, Sicadîn, Nasirdîn**
**Şêşimse qeweta dîn**
**Siltan Şêxadî tanc ji ewelîn, heta bi axirîn**
**heq hemdullah ya „reb al ´alemîn„**
**xêra bide, şera wergerîn**
**mehderekê di xwazîn**
**bi rehma Şêxadî**
**reza Melik Şêx Sin**
**kerema Şêşims.**

**pişka duwê**

**2- nûr ji nûrê şifiqî**
**sibhane ji te xaliqî**
**Meleke li ber tifiqî**

**3- Ji malê heta malê**
**Şêşims xudanê sîqalê**
**em ji Şêşims na birîn xiyalê**

**4- Derecê heta derecê**
**Şêşims xudanê ferecê**
**em dê dest u damanêt Şêşims tuwaf kîn**
**şuna kabetilayê u hecê**

**5- Ji stunê heta stunê**
**Şêşimse xudanê me´rifet u erkan u nasînê**

**6- Ji çava heta devî**
**mora Şêşims lê dikevî**
**meydana mezna, ji germa nahêlin binvî**

**7- Serî heta pêya**
**ya Şêşims te neqşandîn, danayne serê rêya**
**em ji Şêşims na birîn hîvîya**

**8- ya Şêşims! tu li me vekey dergehê rehmetê**
**te em înabûn ser vê xilmetê?!**

**9- Sunî ku sunîne**

**zebunin di mandîne**
**me bi Şêşims hîvîne**

**10-Sunet ku sunete**
**zebune kêm taqete**
**me bi Şêşims eynete**

**11-çأî du´aya extiyarê mergehê kirî**
**cêşê Melik Fexredîn**
**qewalê Şêxadî**
**du´aya qebul, pîrê Libina**
**wan çî du´a kirî**
**me jî ew du´a kirî**[9]

¤ ¤ ¤ ¤

[9] ev dûeaye bo cara yekê li rojnama (Hawkarî),jimare 25/1974 li Bexdayê hate belavkirin, pasî di kitêba ,,ٿzidîyatî li ber rosnaya hindek têkistêd ayinê ٿzidîyan,, ya min û pîr Xidir li sala 1979 belav kirî hate wesandin.Min ev dûeaye ji devê rehmetîyê babê xwe sêx Cindî girtibu.

# Du´a Nezerê

**Heke zarokek derhal nexoş ba, li kêm daba,digotin çava ew piçuke wê girtî, deyk u babên wî(wê) dibirne cem qewlzanekî, yan mirovekî van du´a dizanit u du´a nezerê li ser digot u li gel du´ayê sê cara hîkek li dora serî digêran, yan jî risas di helandin :**

**Ya cebar , ya cebêr**
**ya pîrî kar**
**ya xundkarê ber u behir**
**ya xaliqê lêl u nehar**
**ya rebî! îsmek sitar![10]**

[10] Ido Babe Sêx- zarok di civata meda - govara rosenbîrî nwê, jimare 123 îlona 1989.

# Du´a Şifaqê[11]

**1- Ja Xudê bidî xatirê mêra, Milyaketa,**
**yê didin medeha**
**ewin xasêt nîva qubeha**

**2- Ronîya berê sibeha li me dahir bû**
**borê ´ibadetê swar bû**
**sed xwazka mina bi wê rûhê, li ber**
**heqîqeta xo westiya bû**

**3- Aşiq u maşuqa mirazê xo ji wan dixweste**
**wan mirazê xo ji heqîyê dixweste**

**4- Ya mêrê(mîrê) li ber erkanê**
**ya siba roj u ronkayîyê**
**ya xudayê bilind, xudanê sozdayîyê**

**5- Ya Şêxê heqîqetê**
**ya mîrê sibehê**
**ya sibeha nû**

**6- ya xundkarê şehîd**
**ya nefesa heq, ya surra siltan Êzîd**
**„tuyê xelasîyê„**

**7- Ya siltan Êzîd**
**tu Şêxî, ez mirîd**
**ya Xuda bi razîbuna te**
**wek xwazîya te**
**sêxa, pîra û mirîda**
**yek ji yekî dixwaze.**

[11]Nabo Hesen ev du´aye ji me ra virêkirbû. Du´a ji zarê Êzidîyên devera Helebê u ciyayê kurdaxê hatîye girtin.

**8-Ya Xudê tu du´a me qebul bikî**
**bi dirozîya bawermenda**
**teve du´a yêt extiyarêt mixfî**
**li ber dergehê xasa**
**Xudê amîn**

**9- Xuda! tu li me vekî derîyê xêra**
**me sax bikî bi bawermendara**
**ya Xudê! tu qeza u bela ser me derbaskî**

**10-Bi Şêxadî u şêx „çidanî„**
**u rê u erkanî**
**u zanîngeh ew xudîyê ´erd u asmanî**

**11- bi xwazîya Şêxadî, Şêxê kafê**
**yê ewilê wî ji lewhê**
**girtîye xudayê**

**12- Şêxadî, Melik Şêx Sin bi şêxîtî qebiland**
**´ers u kursî jêra xemiland**
**horiya li asmana jêra hilhiland**

**13- Şêxadî şêxê meqbule**
**rawestîya stuna dîwana Şêxadî u**
**Melik Şêx Sin sewq u nûre**

**14-Ser leşkere binê vê kaniya spîye**
**qubleta subhane**
**bo navê Şêxadî u Melik Şêx Sin dide şehdeye.**

¤ ¤ ¤ ¤

# Du´a Sibê[12]

**1- Sibeye Roj zeriqî**
**nûr ji nûrê şefiqî**
**Melek „emeredîn„ li ber tifiqî**
**sibhane ji navê te xaliqî!**

**2- Sibeye Roj hilat**
**şukrîna me pê hat**

**3- Me ji navê Xudayê Sêsims hêvîyane**
**me yek sedeqe û heya û îmane**
**sibeye ronîya Sêsims dibu beyane**
**nav û dikarê Sêsims dikim silave**
**ronahîya Sêsims dabu çarde tebeqê**
**erd û asmane**

**4- Ji malê heya malê**
**Şêşims xudanê sîqalê**
**em ji Şêşims nabirîn xeyalê**

**5- Ji derecê heya derecê**
**Şêşims xudanê ferecê**
**em dest u damîna Şêşims tewaf dibîn**
**şûna birka kabetlah u hecê**

**6- Ji stunê heya bi stunê**
**çil mifte li hindurê xizînê**
**Şêşims dane destê xudanê me´rifetê, nasînê**

**7- çava heya devî**
**mora Şêşims lê dikevî**
**ji mihbeta mêra, Milyaketa, nahêlin em binvî.**

[12]ev du´a jî hêja (Nabo Hesen) ji mera virêkirîye.

**8- Ji devî heya bi çava**
**mora Şêşims kire nava**
**ya Şêşims me bi te silave!**
**ev du´ya li ba te, ew se´et, ew gave**

**9- Serî heya bi pêya**
**te temam neqşandin, danîye ser dû rêya.**
**me u sunetxanê ji te hêvîye**

**10-Ya Şêşims! te em înane ser vê xilmetê**
**ber me u sinetxanê vekî dergehekî rehmetê**
**bi pirsî halê me u çendî sunetê**

**11-Sinet ku sinete**
**her bi zebûne kêm taqete**
**me bi Şêşims eynete**

**12- Şêşimso! Tî (tu) emînî**
**li ser behra giran dîne**
**sed xozka mine bi wê ruhê be, bideyê**
**jê ne stînî, zor dereca bigehînî**

**13-Ya Şêşims! Tu yî rehîmî**
**xaliqekî minî ji qedîmî**
**hemû derda tî kerîmî**

**14-Ya Şêşims!tî rehmanî**
**xaliqekî minî bi canî**
**hemû derda tî dermanî**
**hemû mexluqa tî xudanî.**

**15-Ya Şêşims!tî mîrê bavê min u çend derwêşa**
**qelendera, feqîra, şêxa,pîra, ewin kanî.**

**16-Ya Şêşims! tu li bangê, gazê**
**li gel extiyara, rêwîya**
**erkan sekinî ser milê qelendera**

**17-Ya Şêşims! tu meferî**
**ya Xuda tu xaliqê minê her u herî**
**tu rizqa didî, rizqa diberî**

**18- Şêşimsê minî nûrîne**
**ser kursîya zêrîne**
**kilîl u mifte bi destê wîne**
**wê vedike derê zor xezîna**
**xelata jê dertîne**
**em u sinetxane ji te hêvîne**
**tu dermanê hemu birîna.**
**„ temametî li Xûdê û Sêxadî û Melik Sêx Sin„**
********************

**Li sala 1933ê „ Celadet Bedirxan„ hinek du´ayên Êzidîyan di belavokekê da li Şamê belav kirbûn; ji ber behayê wanê dîrokî, ewan du´aya wekî hatîne gotin u belav kirin, emê danîne ber çavê xûndevanên delal, her bi vê helketinê em bi çavekî pirr hurmet temasayî xizmeta navdar Celadet Bedirxan dikin.**

# Du´a Sipêdehê

**Bi navê Yezdanê pak û dilovan**
**1- Xwedêyo! ji bona şanê te, şuna te, ji bona**
**padşahîya te**

**2- Ya rebî! Tu yî kerîmî, tu yî rehîmî**
**tu Xudayê mulkê cihanî**
**melkê soq u semayî**
**melkê ´ersê ezîmî**

**3- Ya rebî! tu ji ´enzel da qedîmî**
**ya rebî ta ebed tu kama ruhayî**

**4- Ya rebî! tu melekê cin u însî**
**melekê ´ers u kursî**
**ya rebî tu semed u lift u nimayî**

**5- Ya rebî! tu semedî, hey li mecîdî**
**yek u yekta u bê enbazî**
**ya rebî her tu layîqî medh u senayî**

**6- Ya rebî! tu Xudawendê seperî**
**Xudawendê mah u mehrî**
**Xudawendê çem u nehrî**
**ya rebî tu Xudawendê etayî**

**7- Ya rebî! te ne lome, te ne îndade**
**te ne awaze, te ne renge**
**te ne denge, te ne renge**
**te ne renge, te ne denge**
**ya rebî kes nizane tu kusayî!?**

**8- Ya rebî! tu guhrendey, mendayî qutî**
**tu helîmê melekûtî !**
**ya rebî tu hakimê şah u gedayî**
**ya rebî! herî hayî, herî hayî, herî hayî!**

¤ ¤ ¤ ¤

# Du´a Rojhilatê

**Bi navê Yezdanê dilovan u mihreban**
**1- Ya rebî! tu heyî , ez nînim**
**tu rehmî, ez gunehim**
**tu xudan heqî, ez bendim**

**2- Te ne çone, tuyî çendî**
**te ne bejne, tu yî bilindî**
**te ne awaze, tu yî bi dengî**

**3- Cihê te hemî ´erde**
**tu xaliqê cimletî ´alem**
**te daye hezretî Adem**
**te kir dema me, ev dem**

**4- Ya rebî! tu welîyê ferza nimêjî**
**tu ruhan ji ruha dibirêjî**
**tu ji seran, ruhan davêjî**

**5- Tu ne mîna me kêm dibînî**
**tu li seran ruhan digehînî.**
**6- Ya rebî! tu Xudayî, tu pedşayî**
**tu elîmê elmayî**
**tu Xundkarê ser çend pedşayî**

**7- Te ne xafe, te ne xurde**
**te ne awaze, te ne denge**
**xudan malî , xudan perde**
**cihê te hemî erde**

**8- Tu Xudayî! derdemendim**
**bexşendeyî, bê gunahî**
**layiqî medh u senayî**
**kes nizane tu çawanî**

**9- Tu hem derdî, hem dermanî**
**hekîmê şah u gedayî**

**10-Ya rebî! tu pedşayê ´ers u kursî**
**xaliqê ga u masî**

**11-Ya rebî! bi xatirê navê xwe ke**

**halê Kurdistanê u Êzidîyên rojhilat u rojavayê bipirse !....**

¤ ¤ ¤ ¤

# Paşdu´a

**bi navê yezdanê dilovan û mihreban :**
**1- Amîn amîn**
**Xudê arîkarîya dîn**
**ya rebî xêra bidey, sera wergerîn**
**Şêşimsdîn, Fexredîn**
**Amadîn, Nasirdîn**

**2- Heqo! tu pedşayî**
**xudanê mehr u mahî**
**rezaqê cin u insî**
**xudayê alema qudsî**
**xaliqê cin u insî**

**3- Şerfedîn xerzê gulî(kulî)**
**mizgînê bînê Kurdistanê**
**bila veken deftera îmanê**
**Şêşims roja Êzidîyane**
**Şerfedîn mîre li dîwane.**

**4- Şilîxan biketin Kurdistanê**
**wê topan berdetin Turkistanê**
**textî raketin bibte Kurdistanê**
**qeda dikevte mala ´Erebistanê.**

¤ ¤ ¤ ¤

# Du´a Nîvro

**zidî sibeykê berê xwe didin rojhilatê û êvarî berêت ûnkeا demê roj li nîveka asmanî ,nîvro jî ,xwe didin rojavayê zidî berê xwe didin Lalisa nûranî û dûeayaت ,disekine : dibêjin ,xwe dikin**

**1- Ya rebî! tu bideye xatira stuna ´erd u asman**
**leylûn, leylet li qedir u „suret li rehman„**
**ya rebî ji her çar mala[13] bo me u sunetxanê**
**virêkey han**

**2- Ya rebî! tu bideye xatira gayê binê dinê, masîyê bi tinê**
**kerema xudanê xîveta vedayî li ser girê kela dingizê**
**ya rebî! tu bo me u sunetxanê virêkey derwêşê**
**runiştî li kafa Zimzimê**

**3- Ya rebî! tu bideye xatira surra çêbûy li nav**
**mêra di xewlexanêda**
**ê xo kirîye pisê Şêxadî di mixarê da**
**ya rebî! tu me u sunetxanê xefir bikî ji gunehêt**
**me kirîn li gel dayî u babêda**

**4- Ya rebî! tu bideye xatira Melik Şêx Sinê Adiya**
**ê serê xwe dayî pêxama me sunîya**
**ya rebî! tu bo me u sunetê virêkey rizqekî ji**
**xizîna xweya jorîye.**

**5- Ya rebî! tu bideye xatira şêxê sunetê**
**çend xas u mominê bo te dikin ´ibadetê**
**ya rebî! tu bo me u sunetxanê virêkey rizqekî**
**ji xizîna xweya qudretê**

**6- Ya rebî! tu bi xatira aşê mihbetê kî, u her**
**heft dergehêt qudretê kî**
**U her çar kilîlêt mehrifetê kî**
**ya rebî! tu pisyareke xêrê li halê me u sunetê kî**

**7- Ya rebî! tu bidey xatira mêrê li zuhayê**

[13]diyare raman ji herçar mala, malên Adîyane; anku: ucaxa Adanî, Şemşanî, Qatanî, Pîranî...

**kerema gelîyê Laliş, dar u berayê**
**ya rebî! tu me u sunetê xilas kî ji qedayê belayê**

**8- ya rebî! tu bideye xatira swarê swar bûyî**
**nîveka rojê**[14]
**hatî ji serqê çoyî bo xerbê**
**ya rebî!tu gunehêt me xefir bikî u çendî sunetê**

**9- Ya rebî! tu bideye xatira sûrra herçar qirifta**
**u kerema herheft meleka**
**ya rebî! tiştê ji te dixwazîn: dîn u îmane, ne dewlete**

**10-ya rebî! tû bideye xatira sev u roje behişt u doje**
**ya rebî! tu me u sunetê bixune dîwana xas u**
**mominêt jore**
**ya rebî! her tûyî, her tûyî, her tûyî.**

¤ ¤ ¤ ¤

[14] bi bawerîya Êzidîyan nek her sibê u êvarî swarê xwe heye, belkî,,nîvekarojê,,jî .eve wê fikrê xoya dike ,,Roj,, li ser erebanekêye u çend hesp di kêsin. ev sinbol u fikre li cem milletê Misopotamiya, Misrê,Grîk,...Hd derdikeft.

# Du´a Hêvarî[15]

**Demê hêvarî, her wekî sibê, ew mirovê ibadeta xwe dike,pistî dest û çavên xwe diso, pista xwe girêdide, tistekî dihavêje ser serê xwe, berê xwe dide rojavayê, bi rêz û hûrmet disekine û dûeaya xwe dike.Demê ji dûeayê xilas dibe, xwe diçemîne û sê cara li sûna Rojê erdê maç dike, xêr û tenahîyê, bê belayê, derbazkirina gûnehan, rizqa...ji xûdanê Rojê û Milyaketa dixwaze. Helbet her Êzidîyek dûeaya xwe bi tinê, li ciyekî xewle dike. Dûeaya êvarî bi vî corî tête gotin :**

**1- Ya swarê rojhilatê, rojavayê[16]**
**hûn bidene xatira dotê u dayê[17]**
**hun me xilasken ji qedayê, ji belayê**
**ya Şêşims tu halê mala xo bipirsî u me jî vêcarê**

**2- Hûn bidene xatira ´erş u kursî**
**gay u masî**
**„heyat li kursî„[18]**
**ya Şêşims tu li halê mala xo u me jî pirsî**

**3- Hûn bidene xatira lewh u qeleme**
**Hawa u Ademe**
**Isa bin Miryeme**
**ya Şêşims tu halê xo u me jî bipirsî li hemu deme.**

[15]têkista vê du´ayê ji kitêba ,, Êzidîyatî......,,p.29-31 wa hatîye wergirtin.
[16] Li gorî baweriya Êzidiya u li pê vê sebeqê wisa diyar dibe Roj xudanê wê heye, ew xudan jî li ,, hespekî,, sware, di keve pêşiya wê Rojê ji rojhelatê dibe rojavayê, yan bêjîn ( wek baweriya Misriyên Kevin) Roj di ,, erebekê,, daye u hesip di kêşin ji rojhelatê di bene rojavayê.
[17] Dot u day: deyk u qîz, ji dû alîyave di hête şirovekirin: ,, heyv,, wekî dayk u ,,Roj,, wekî qîza wê, li gorî bawerîya Somerîya. Yan jî: Sêx Sin u Şêxadî. Li cem Êzidîyan Şêx Sin, şêxê Şêxadîye.qewl dibêjit :

***Şêxadî Melik Şêx Sin bi şêxînî qebiland***
***´er´ u kursî bora xemiland***
***Milyaketa li asmana jêra hilhiland.***

her wisa demê berê ,,Sin,, Xûdanê heyvê bu.
[18] ,,heyat al kursî,, diyare mebest jê ,, ayet al kursî,, ye.

**4- Hûn bidene xatira çerxan u feleke**
**horyan u Meleka**
**surra Tawsî Melek u çarde tebeqa**
**ya Şêşims tu pisyareke xêrê li mala xo u mejî bike**

**5- Hûn bidene xatira behştê u darê**
**kafê u mixarê**
**surra Êzî u bêt li farê**
**ya Şêşims ! tu pisyareke xêrê li mala xo u**
**mejî bike vêcarê.**

**6- Hûn bi xatira durrê ken, kasê ken**
**exriyarê surr mixfî, pê pira selatê ken**
**ya Şêşims! hun pirseke mala xo u mejî biken.**

**7- Hûn bidene xatira Durra spîye**
**Melekê bêrîye surra Êzîye**
**ya Şêşims! li dîwana siltan Şêxadî, tu bo mala**
**xo u me jî bikî hîvîye.**

**8- Hûn bidene xatira Durra sore**
**Êzdîne mîre, qublet li bidore**
**ya Şêşims! Bang u hawarêt me bêt Melekê jore.**

**9- Hûn bidene xatira Durra zere**
**ax u av u bayî u agire**[19]
**erd u asman u bere**
**Êzdîne mîr u herçar surre**[20]
**ya Şêşims! tu bangîna mala xo u mejî were.**

**10-Hûn bidene xatira suka ma´rîfetê**
**mêrê li ber bedlê diket xilmetê**
**derwêşê şev u rojê diket ´ibadetê**
**her pênc ferzêt heqîqetê:**
**şêx u pîr, hosta u merebî, yar u birayêt axretê**
**ya Şêşims! tu meferiyeke mala xo u me jî bike vêcarê**

---

[19] ax, av, agir, bay : herçar matiryalên dinya pê peyda buye. Herçar li cem Êzidîya di pîrozin u rastîya dinyayêne.

[20]herçar surr :dibe raman jê: Şêşims, Melik Fexredîn, Melik Nasirdîn, Melik Sicadîn. yan jî mebest jê dîsan heqîqetên dinyayê be: ax, av, agir, bay.

**11-Hûn bidene xatira du´ayêt fêran**
**rebenêt binê dêran**
**ya Şêşims! tu li mala xo u mejî bikey sexbêran**

**12- Hûn bidene xatira kursîya rehmana**
**Melekê Cana**
**behra qudsî Cana**
**ya Şêşims mejî te divêt dîn u îmane**

**13- Hûn bidene xatira, Izrayîl, Cibrayîl**
**Mîkayîl, Sifqayîl, Dirdayîl**
**Izafîl, Izazîl**
**ewin her heft melekêt kibîr**
**di destî da mifte u klîl**
**ew jî li ber hizreta melekê celîl.**

¤ ¤ ¤ ¤

# Şehda Dînî

**Berî mirovê êzidî razê, serê xwe danê ser balgîyê, ji tirsa mirinê, canê xwe helal dike, sehda xwe dide, dibêje:**

**1- Şehda dînê min êk ella**
**Melik Şêx Sin heq hebîb ella**
**meqlub u merge sela**
**silavêt mêra li Lalişê, meqlubî, birîmehê cotêt quba**
**li wî ´erdî, ´erdê êzidîdxane ser dikêşine,**
**ber Şêxadî, ´ebadetê, sicudehê**

**2- Siltan Şêxadî pedşê mine**
**Şêxu Bekir mewlayê mine**
**Siltan Êzî padşê mine**
**hecî mehmed pîrê mine**
**Şêx Mehmed merebîyê mine**[21]
**Tawsî Melek şehde u îmanêt mine.**
**Kanîya spî mora mine**
**Kaf u mixar u Zimzim heca mine**[22]
**qublet li bidor qubleta mine**
**Melik Şêx Sin baxoyê mine**
**Şêx Musê sor xudanê mine**[23]
**Şêşims mesebê mine**
**bînaya cavêt mine.**
**3- Minetkarîn ji Adîya**
**vavartîn ji kafira, ji rafidiya**
**em havêtîne ser pişka sunîya**

**4- Minetkarîn ji Mîra**
**vavartîn ji kafira, ji xenzîra**
**em havêtîne ser pişka şêx u pîra**

**5- Minetkarîn ji minetê**
**vavartîn ji kafira, ji şir´etê**
**havêtîne ser pişka Şêxê sunetê**

**6- Heke Xudê kir êzidîne**
**ser navê Siltan Êzîne**

---

[21] her mirovekî Êzidî navê şêx , pîr , merebîyê xo dibêje.
[22]yan dibêjin : Laliş heca meye.
[23] Her Êzidîyek navê xudanê xo dibêje.

**şikir em bi ol u terqetêt xo di razîne.**

¤ ¤ ¤ ¤

# Du´a Tawsî Melek

**Ev du´a ji wan du´ayên pir giringe, li gelek cî u dema dihête gotin. Ne gereke em bêjin Tawsî Melek kîye u rola wî di dîn u baweriya Êzidîyanda çîye; çunke du´a bi xo, persiva vê pirsiyarê dide u ciyê bilindê Tawsî Melek de xoyakirinê. carna dibêjin: du´a Tawsî Melek, carna jî qewlê Tawsî Melek, diyare gotina du´a bitir li gel naverokî di guncê :**

**1- Ya rebî! „´ela şanek, ´ela mekanek, ´ela siltanek„**
**ya rebî tu Xudayî![24]**

**2- Ya rebî! tu melekê canî**
**tu melekê melkê kerîmî**
**tu ji ´enzeldayî qedîmî**
**heta hetayê tu kama ruhayî**
**ya rebî tu Xudayî!**

**3- Ya rebî! tu Melekê cin u insî**
**´Erş u kursî**
**semedî lift u lemayî**
**hey li mecîdî**
**wahid li ferd li hemîdî**
**ya rebî tu Xudayî.**

**4- Ya rebî! tu xudawendê seferî**
**tu xudawendê meh u merî**
**tu xudawendê çendî omerî**
**tu xûdawendê etayî**
**ya rebî tu Xudayî.**
**5- Ya rebî! ji nava (isma) tuyî bilindî**
**te nav çende tuyî çendî!**
**tu miza zendê du payî**
**ya rebî ! tu Xudayî**

**6- Ya rebî! tu keremdayê hutî**
**tu mendayê qutî**
**tu halimê ilmayî**
**ya rebî! tu Xudayî**

[24]xudayî: anku xo bi xo daye= xoda- xudê

**7- Ya rebî! tu xudan malî, xudan perde**
**ciyê te li hemû ´erde**
**ya rebî! tu Xudayî**

**8- Ya rebî! te ne „lone„ te ne renge**
**te ne awaze, te ne denge**
**te ne „indame„ te ne denge**
**ya rebî! kes nizanit tuyî çawanî!**

**9- Ya rebî! tu welîyê nimêjî**
**tu mal u milka diberêzî**
**ya rebî! tu Xudayî**

**10-Ya rebî! tu hakimê şah u gedayî**
**tu hakimê cimletî ´alim**
**te tobe kirbu li Adem**
**rêbu Isa bin Miryem**
**ya rebî! tu Xudayî.**

**11-Ya rebî! tu rehmî, tu keremî**
**tu emînî, tu semedî**
**em çû nînin**
**ya rebî! tu Xudayî**

**12-Ya rebî! êk nema li tayî**
**ya rebî! ez ketîme, tawîme**
**tu dermanî, tu hekîmî**
**tu hekîmî, em di xerîbîn**
**ya rebî! tu di zanî derd u dermanê me li ku dibî**

**13-Ya rebî! tu unsê xurbayî**
**suc u gune u mişutî**

**14-Me nas kirin, me kirin tehiyat u goşe**
**ya rebî! her tu me bibexşe.**
**ya rebî! tu heyî, tu heyî, tu heyî.**

¤ ¤ ¤ ¤

# Du´a Oxirê

**Bi desturî Xudê**
**1- çî subeyek hoye kubare**
**derê behiştê li ber min vebu, herçar yara**
**ez çome silavî biran u yara**

**2- Min silav li yar u bira kirî**
**horî hatin û bûhirîn**
**qintar û qewsen ji hev kirî.**

**3- çome ser rêya heqîyê**
**xam u ´enkar, leng u berleng pêşîyê**
**banga mine Xudê u Melekê ber kursîyê**

**4- Rêya heqîyê qendîla tijî xêr u bereket u nûre**
**banga mine Xudê u Melekê xefûre**

**5- Rêya heqîyê xefûrê(xefîrê) rêye**
**heke çiyaye(deşte) u heke berîye**
**destê me li dang u damana Şêxê Adî u**
**Melik Şêx Sinê Adîye**
**em bi sax u silametî ji van ciya biçîne wan ciya**
**em bi sax u silametî ji wan ciya bêyne van ciya**

**6- Banga mine Şêşimsê Tetere**[25]
**li ber sekinîn heftî hezar Xas u qelender**
**kember best, xerqe res, hile zer**
**li vê seferê, li vê oxirê**
**tu li min u hevalêt min,bikî xêr, her u her**

**7- Ya siltan Êzî! perda te li ber me bit**
**ya Pîrafat! çarka teye li me werkirî bit.**
**8- Ya Derwêş al-´erd! bi saxî ez êmanetê teme**

---

[25] Teter: ewê dihêt u diçit, posteçî. li gorî şirovekirina xala 2 di perawêz da, demê dibêjin: Şêşsimsê Teter, yan Şêşsimsê wezîr, heke li vir da wek mirov û giyan li ber li Şêşsimsê binêrîn, diyare wek wezîr dihat u ço, di xizmeta Xundkarê mezinda bû. li alîyê din demê wekî surr li Şêşsimsê binêrîn, anku wek nîşana ..Roj,,ê. li gorî bawerîya mirovê berê Roj digerê; sibê ji rojgilatê derdikeve u ber bi rojavayê diçe, ji ber wê yekê dibêjinê ,, Şêşsimsê Teter,, yan jî Şêşsimsê ji êla Teterêt Tebrîzê li Îranêye.

**bi desturî Şêxadî, Melik Şêx Sin u xefûrê rêye.**

¤ ¤ ¤ ¤

**Du´a Oxirê li cem hindek mirovan li sebeqa (5,6)êda wisa tête gotin:**

**5- Rêya heqîyê xefîrê rêye**
**eger deşte, eger berîye**
**min ji Şêşimsê hîvîye**
**silametî li bêxêrê min,**
**ji van ciya bibte wan ciye**

**6- Rêya heqî, Melik Şêx Sine**
**xefîrê rêyane**
**eger deşte u eger zozane**
**Şêşims u Melik Şêx Sin bo min bêt hane**
**silametî li bêxêrê min, ji wan ciya bînte van ciyane.**

¤ ¤ ¤ ¤

# Du´a Biskê

**Bisik girtin, ferzeke ji ferzên dînê Êzidîyan. Mirovê Êzidî - helbet kesên nêr- demê dimire na hête veşartin, heke biska wî ne hatibite girtin. bi tinê şêxên Şêx Sina pîrê wan biska wan digire[26], lê belê hemu ئzidîyên din- bi sêx û pîr û mirîdave- sêxê wan biska wan digire.Bisk demê zarokîyê bi destê sêx (destê pîr bo mala Adanîyê)tête girtin û gereke sêx an pîr wî demî vê dûeayê bêje, kû jê xilas bu ,sê cara bi meqesê hindek pora zarokî bibire :**

**Biska biskane**
**biska Şêxalê Şêşimse**
**kaf bilind bû ço asmane**

**bi şehdeya Şêxadî u mêrane**
**wê li nav da şêxê şêxane**
**înane xwar leylun, leylet li qedir,**
**„suret alrehmane„**
**Şêx Se´îd pê didet nîşane**
**Şêxu Bekir ser mekane**
**ya Şêxadî u Melik Şêx Sin, ji me dest, ji we du´ane**
**tu vê biskê bikey çil biskane[27]**
**fitoyê vê biskê gaye, an berane.**

¤ ¤ ¤ ¤

**yan jî li hindek têkista wisa tête gotin:**

**Biska biskane**
**biska Şêxalê Şêşimse**
**bi şehdeya Şêxadî û mêrane**
**roja kanîya Spî dane**
**du çiya li hev ketin weke du berane**
**di navda hene sêxê sêxane**
**ya Xudê u Melik Şêx Sin**
**ji me dest, ji we du´ane**

---

[26]çunke Şêx Sin şêxê çil şêxane, ewî„ ewan„ şêxê biskê nîne. Pîrê wan biska wan digire.(bo zaniyarîyên zêde dikarin birênne vekolîna min ya sêyan:ber bi zanîna rastîya dînê Êzidîyan) kitêba 3 1994.

[27] Nîşane ji zêdebûnê ra. Zuret u mirîdêt şêx zav dibin.

**tu vê biskê bikî çil biskane**
**qurbanîya vê biskê, gaye an berane.**

# Du´a Kêma Heyvê

**demê heyv li asmana nû dibû gelek zarok bi nexoşîyê diketin, tayî dihatê u bijwangên wan dibûne cot, xelkê digot: „ser u binêt heyvêne„ di wê baweriyêda bûn ji ber deketina heyva nû, nexoşî wan piçûka digirit, diçone cem şêxekî Melik Fexredîn, dest u enîya zarokî bi teniyê nîşan dikirin (reş dikirin), yan diçone cem qewlzanekî „du´a kêma heyvê„ li ser digotin :**

**li min u vê malî**
**Şêx Fexrê Adîya pala xo dabû stuna malî**
**wê bi vir çî qen fi´lî**
**ji qelsîya jinê,  ji xesîsîya mêrî**
**girara hêvarî**
**nedrê tefalî**
**tefal dê rabite nava malî.**[28]

¤ ¤ ¤ ¤

[28] Ido Babe şêx, jêderê berê.

# Du´a Sifrê,, Xwarnê,,

**Baştirîn u ciwantirîn du´a li ser xwarnê dihête gotin, ewe ya Êzidîyêt Ermenistan u Corcistanê dibêjin ku bi vî rengê xware :**

**1- Ya rebî tu dayimî, tu kerîmî**
**tu ´erşê ezîmî**
**ji enzelda tuyî qedîmî**
**heftî dû millet bêy rehmê**

**2- serê ser balgîya**
**girtîyê hebsîya**
**rêwîyê rêya**
**kesîf, belngaz u hêsîra, me jî pêra**

**3- Hûn maş bin, berat bin, xelat bin**
**kur u qîz, dewlet u îman u axret bin**

**4- Xem neve(nebe), derd nebe**
**rizqê hazira kêm nebe**
**siyar bûye, peya nebe**
**şîn u şaya kêm nebe**
**dost u dijminara şermîn nebe**
**xanî bê derî nebe**[29]
**mêr bê serî nebe**[30]
**çiya bê kerî nebe**[31]
**ava gelîya u kanîya ziha nebe**
**nan ji xizîna Şêxadî be**
**hêvênî ji Kanîya Spî be**
**sifre bi destê Celîl be**
**bi bereketa Birahîm Xelîl be.**

¤ ¤ ¤ ¤

[29] Xanî bê derî nebe :ankû ew male here avabe, ûcaxkor nebe.
[30]Mêr bê serî nebe :ankû jin û zelam bê sûkirin ,,zewcîn,, nemînin, hem bo zêdebun û berdewam buna zûretî, hem bo parastina namusê.
[31]Çiya bê kerî nebe : nîsane bo îs û karî, çûnke deverên çiyayî, zozanin û pawanên herebasin ji xoyî kirina pezîra.